Be Soranî.Hengawêk bo pêşewe (pexşan)
Ahî diway Eşqêk

Zana.Q.Dizeyî

Renge temenî xoşewistît nek tenha azar û bes, belkû tam û bo û çêjêkîşî bûbê,çûnke min wek ciwan pristê çêj le azarekanî eşiq werdegrim û hemîşe fû le pişkoy zamekanim dekem bo ewey azar le giyanimda hergîz hêwir nebêtewe û keştî şi'irîşim le hîç derbend û kenarêka lenger negrê.

Welê nazdar to ew şitle bûy ke her be naskî le nêw korî warana gûlbijêrim kirdî û le baxî jiyanîş da be sertilim danay û hemû mehalêkîşim bo berceste kirdî.

Welê nazdar to ew mange bûy ke le şewda û le baweşî asman debîndiray,boye her carêk û her satêk lêt dûrbam rengî şewim depoşî.

Welê nazdar to, to..to..to, hemû ştêk bo to bû!,to toray û xendekanîşim reşyan poşî û bala û nîwêk destiyan berz kirdewe û mal awayîyan le lêwekanim kird, katê zaniyan îdî wişke sale û carêkî tir nûsanyan be lêwekanî towe xewne û xeyale...nûsanyan be lêwekanî towe herame û mehale.

Welê nazdar to,min nazanim le kame rûbar û le kame oqyanûs masî hezekanim bênim u be renge meramiyekanyan be toy bê mirwetyan nîşan bidem?! Ke to ne be çawî xot le şaşey min derwanît û ne be gwêy xot gwê bo dengim û ne be lûtî xot bonî beharim û ne be dem û ne be dengî xot hevpeyvînim nakey..

Welê nazdar to,ê min çî bikem ke to xawenî xot nît û le mana û ciyawaziyekanî(beheşt û dozex),(frişte û ehrîmen),(reş û sipî) tê nagey?!

Welê nazdar to, Welê nazdar min peymanî gewre gewrem dawe, îdî çon detwanim xom le qisekanim bidizmewe û piyawetîşim biparêzim? Ey nalên ewey xawen qisey xoy nebê.....?

Welê nazdar, emane hemûyan rastîn û têyan nageyn,renge têyan bigeyn belam xoman gêl kirdibê!.

Welê nazdar gûnahî min tenha xoşwistinî toye,boye tenya daway lêbûrdin le to dekem û dozexiş me'way gûnahbarane.

Welê nazdar,efsûs ke peşîmanî dadî kesî nedawe ta dadî min û to û tawanbaran bidat.

Welê nazdar to, welê nazdar min,welê nazdar em millete!...

Ke xoşe le diwa mal awayîm bibexşît û mal awayîm qibûl bifermûy û mal awaş le mal awayî...